



PÊŞÎLÊGIRTIN LI KORONAYÊ LI NAV KOMPANIYÊ

Babetên herî girîng bi awayê kurt

Jibo „IG Metall“ ron û zelal e ku: Di qeyrana Koronayê da tendurustiya hevkarên yekemayetiya herî bilind e. Ji ber vê yekê divê li hemî cihên karkirinê kiryarên bibandor ku metirsiya tûşbûna kedkarên digehînin asta herîkêm a pêkan, pêk bên.

Korona pêwîst dike ku parastina tendurustiyê were zêdekirin.

Rewşa metirsiyê aşkîra û ron e û nabe ku demeke dirêj were hilkolandin û lêkolînkirin. Metirsiya tûşbûna bi Vîrûsa Koronayê hertim û li her derê heye – ev metirsî li cihê karkirinê jî heye. Armanca sereke ya siyaseta pêşilêgirtina Kompanyî di rewşa belavbûnê da, kêmkirina leza belavbûna Vîrûsê û parastina kedkarên e. Di vî warî da, ev mijar tekûz û bêguman in: **Karkirina di rewşa vegirbûna vîrûsê da pêwîstî bi parastina tendurustiyê gellek zêdetir ji rewşa asayî heye.** Û: Wek mînak kesên ku berê pîrsgirêkên wan ên tendursitîyê hebûne, yanî xebatkarên ku di nava xetere û rîsêke giran de ne, ji bo wan divê bergirîyên taybet bêne wergirtin.

Plandarêştina rêkara pêşilêgirtinê û behrewergirtina ji berpirsiyariyan

Plandarêştin û cihanîna rêkareke bibandor jibo pêşilêgirtin ji tûşbûna bi Koronayê li kompaniyên divê heta radeya pêkan bilez pêk were. Ji ber ku Vîrûsa Koronayê nemaze bi riya tûşbûna ji ber Hûredilopan û têkiliyê tê veguhestin, kiryarên parastinê jibo kêmkirina herî zêde ya xetera tûşbûnê, bala xwe didin ser piştrastbûn ji navbira ewleh a pêwîst navbera kedkarên, her wiha kiryarên paqijiyê. **Li vir kedkar erkên jêrê digirin ustiyê xwe: Ewna li gorî qanûnê berpîrsê parastina tendurustiya kesên in.** Ev berpîrsiyarî li ser milê xwediyên kar û pêşeyan heye ku kar û xebatê bi awayekî organîze bikin û amûrên teknîkî bi awayekî bi kar bînin ku berçavgirtina pêwîstiyên navbir-danîn û paqijiyê pêkan be.

Helbet Konseya Kedkarên Kompanyî jî erkên girîng girtine ustiyê xwe. Ev konse divê di warê nîrxandin û cihanîna kiryarên pêwîst xwedan pişk û par be. Amûrên ku têkildarî rêbazên pêşilêgirtinê li ber destê Konseya Kedkarên Kompanyî ne, hatine naskirin û jibo pîrsgirêkên nû jî guncan in. Ev amûr beşdarbûna di biryardanê da û nîrxandina xeterê ne. Xaleke girîng di vî warî da: Derbarê Koronayê cihanîna qonaxa pîrranî dirêj-dem a nîrxandina xeter û gefê êdî pêwîst nake. Tî şik û gumanek tune ye ku xeter zêde ye. Ji ber vê yekê ev mijar dikare li Kompanyan were hilkolandin ku li kîjan artmosferên karî destûrkarên Navbir-danîn û paqijiyê nehatine berçavgirtin û li gorî vê yekê kiryarên pêşilêgirtinê pêwîst in.

Cihanîna kiryarên li gorî “Xala Teknolojî, Rêxistin, Kedkar” (“TOP-Prinzip”)

Pîvanên ewlehiya karî yê daxwazkirî divê li kompaniyên bi riya kiryarên parastina teknîkî, birêxistinîkirina karî û kesane serê xwe bigirin. Naskirina xeter û metirsiyên heyî li cih diyar dike ku çî cûre kiryarên Parastinê li Kompaniyê divê bi awayekî babetî bî berxwegirtin. **Helbet ev yek ron û zelal e ku: “Xala Teknolojî, Rêxistin, Kedkar” (“TOP-Prinzip”) tê sepandin.** Qanûna ewlehiya karî, kiryarên teknîkî pêşdatir û girîngtir ji kiryarên rêxistinî dizane. Kiryarên kesane ji hêla girîngiyê va di cîgeha sêyem da ne. Parastina li hemberî tûşbûnê renga tenê di rewşekê da gellekî bi bandor be ku kiryarên cûrbecûr bi hev ra pêk bî.

Fêrkirin wek kilîta serketinê ye

Heke hevkar bi qasî pêwîst di pêkanîna karan pişk û para wan tunebe, dê baştirîn kiryar jî encam û bandora baş pêk neyînin. Fêrkirina pergalemend û pêwîst kilîta Pêşlêgirtina serketî ji Vîrûsê ye. Helbet babetên jêrê jî ji kedkaran hatiye daxwazkirin: Ewna divê ku bala xwe bidin ser destûrkirên navbirdanî û paqijiyê û di vî karî da beşdariyê bikin ku hemî kiryarên pêwîst ji aliyê hemî kesên va bî piştgirîkirin.

Kiryarên jibo pêşlêgirtin ji tûşbûna bi Koronayê

Kiryarên teknîkî yê bijartî

- ▶ Danîna navbirên herîkêm di geyta tomakirina dema têtetin û derketinê an Geyta gerrînekî bi Nîşanedanîna li ser erdê
- ▶ Di nava makîne û mobîlyayan de navberek bê hiştin ku mirov pê dilnîya be, ji nû ve bi cî bikin
- ▶ Danîna dîwarên veqetîner ên zelal
- ▶ Bikaranîna salûnên din
- ▶ Ekîpmanên hewadarkirinê bo rewşa nû amade bikin, bi rêk û pêk hewadarkirinê pêk bînin
- ▶ Dabînkirina amûrên zêdebarî

Kiryarên rêxistinî yê bijartî

- ▶ Piştirastbûn ji navbira herîkêm di odayên guherîna kincan, destav û cihên bêhnvedanê û salûnên xwaringehê
- ▶ Veçêkirina riyên hatûçûna li nav kompaniyê
- ▶ Veplandarêştina pêvajoyên xebata di xetên berhemanîna da bi awayekî ku berçavgirtina navbira herîkêm di navbera Kedkaran da pêkan be
- ▶ Guhertina pêvajoyên kar li Ofîsê, lihevkarîna derbarê rêzik û qanûnên Dûrkariya gerrîneyê
- ▶ Lihevkarîna derbarê saetên karî û demên bêhnvedanê yê guhertî
- ▶ Eger ne zerûn be ger û geştên ji bo karî nekin, ji çalakîyên mecbûrî yê li derve tînin kirin piştirast bin ku bi baldarî hatine plankirin

Kiryarên kesane yê Bijartî

- ▶ Berçavgirtina nîşaneyên ihtimalî yê nexweşiyê beriya destpêbûna kar
- ▶ Dûrbûna ji kombûna mirovan li wesayîlên hatûçûna gelemperî dema vegeyriyana ji cihê kar û çûyîna bo cihê kar Heta radeya pêkan; Bikaranîna erebeya kesane, duçerxe an servîsa hatûçûnê ya taybetî kedkarên Kompaniyê ku tede rêzîkên navbir-danîna fîzîkî Tînin berçavgirtin
- ▶ Bikaranîna maskeya dev û poz an amûrên parastina kesane heke pêkan e
- ▶ Dema hun bikuxin û bipişkin li paqijîya destên xwe miqate bin û pabendî qaîdeyên rabûn û rûniştinê bin

Sprache: kurdisch

IG Metall-Vorstand | FB Arbeitsgestaltung und Qualifizierungspolitik | Ressort Arbeitsgestaltung und Gesundheitsschutz | Wilhelm-Leuschner-Straße 79 | 60329 Frankfurt am Main

Çavkanî: Corona-Prävention im Betrieb. Infektionsrisiken durch Arbeitsgestaltung und Gesundheitsschutz minimieren. August 2020. www.igmetall.de/im-betrieb/gesundheits-und-arbeitsschutz/corona-praevention-beschaefigte-im-betrieb-schuetzen

